Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1084 | 23-Tîrmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Klîba nû ya Bermal Çem 'Henasa Şoreşê'

**Bermal Çem, bi boneya salvegera 11'emîn a Şoreşa 19'ê Tîrmehê, klîbeke bi navê "Henaseya Şoreşê" derxist.**

Hunermend Bermal Çem, bi boneya salvegera Şoreşa 19'ê Tîrmehê klîbeke nû ya bi navê Henaseya Şoreşê çêkir. Bermal Çem îşaret pê kir ku bingeha hest, stran û berhemê ji şoreşa ku şehîdan ava kiriye tê û got ku wê ji lewma strana xwe kiriye diyarî ji hemû Şehîdên Şoreşa Rojava re.

### 'Em hûnandina hunerê û şer bi hev re dikin'

Bermal Çem diyar kir ku wê xwestiye dema derketina stranê û salvegera şoreşê yek be û di der heqê strana xwe de wiha got: "Şoreşa Rojava ji cîhanê re bû mînak. Lewra şoreşeke wisa bû ku gelek zarok, ciwan, jin, dayik û bav di eniyên şer de bi hev re bûn şehîd. Bajar bû mîna goristanê lê li ber hêzên faşîst ên mîna DAIŞ'ê û dewleta Tirk şoreşeke fedaiyane û bêhempa hat pêkanîn. Hêzên Parastina Gel (HPG), Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastinê yên Jin (YPJ) û gelê me şoreş pêk anî. Min jî xwest bi rêya stranekê pariyek be jî bibim tercûman ji hestên şervanan re, van nirxan parve bikim. Bingeha hemû hest, stran û berhemên me ev şoreş e. Bê guman ên hestên şoreşê gihandin dîrok û pêşerojê û ev şoreş gihand hemû cîhanê şehîdên me ne. Ev şoreş hêj berdewam e. Lewma huner, şer û jiyan bi hev re berdewam in. Em van bi hev re dihûnin.





Di salvegera 11'emîn a Şoreşa 19'ê Tîrmehê de ez strana xwe dikim diyarî ji hemû şehîdên Rojava re."

Gotinên Klîbê ku Medya Doz nivîsiye, muzîka wê Bermal Çem, sererastkirina wê jî Hadî Morardî kiriye, ev in:

### HENASA ŞOREŞÊ

Dilop-dilop kom bûn xeyalên sor,
Yek bi yek şîn bûn kulîlkên mor.
Pêl bi pêl ala serxwebûnê rabû jor.
Pêl bi pêl.
Şoreş bû dayika dilovan,
Dergûşa mirovahiyê hejand.
Şoreş bû bavê dilsoz û kedkar,
Xwêdana pak û şerefê rijand.
Şoreş bû. Jinên çeleng deng vedan,
Bi xwîna xwe yê şîrîn bûne destan.
Şoreş bû. Xortên bedew û ciwan
Bi xwîna xwe ya şîrîn bûne destan.
Siya çiya bû stara bajara,
Eşqa azadî ket dilê gela,
Şoreşa efsûnî bû diyariya gela.
Ya gela.
Çend xweş e azadî li zinara,
Wek ava cemidî li kaniya.
Çend xweş e azadî li ezmana,
Wek baskê spî li şînahiya.
Çend xweş e azadî, wek dermana
Li ser êşa birîna birîndara.
Çend xweş e azadî li çar hêla,
Digere bi heybet li nav guhdara.

# Şopa herî kevn a mirovên li Emerîkayê hate dîtin



Li Şîliyê di encama lêkolînên arkeolojîk de şopa herî kevn a mirovên li parzemîna Emerîkayê hate dîtin.

Li herêma Pilauco ya li başûrê Şîliyê ku welatekî Emerîka Başûr e, li sîteyeke arkeolojîk beriya niha şopê lingê mirovekî hatibû dîtin. Eşkere bû ku dîroka şopa hatiye dîtin 15 hezar û 600 sal e.

Li gorî lêkolîna li kovara PLOS ONE hate weşandin, li sîteya arkeolojîk a li Pilaucoyê ji sala 2007'an ve lêkolîn tê kirin û şopa lingê mirovan ên demên berê hatin dîtin.

Herî dawî di Adara 2018'an de li eyaleta British Columbia ya Kanadayê şopa mirovan hatibû dîtin û eşkere bûbû ku dîroka wê jî 13 hezar sal e.

Ji jeologan Mario Pino ji rojnameya El Austral de Osorno re axivî û diyar kir li parzemîna Emerîkayê gelek şopên mirovên ji serdemên berê hene. Pino got, tevî vê yekê jî şopa ku dîroka xwe ewqasî kevn e heta niha nehatiye tespîtkirin.

# Koma Şehîd Serhed

**Koma Şehîd Serhed a dîlanê zêdetirî 25 salan e rêya hunerê ya şehîd Hozan Serhed dişopîne.**

Koma Şehîd Serhed bi rêya parastina mîrasa ji pêşiyên xwe wergirtiye; berê û niha bi hev ve girê dide û xîtabî siberojê dike.

Koma Şehîd Serhed di 1992`yan de bi destê welatiyên kantona Efrînê hate damezirandin ku parastina mîrasa folklorîk bike.

Girêdayî mijarê, Ebdurehman Îbo (78) ku ji damezirînerên komê ye, got derkeftina tevgera azadiyê ya bi rêbertiya Rêber Abdullah Ocalan û hevrêyên wî û belavkirina fikrên parastina çand û ziman, bandoreke mezin kir ku ew biryarê bidin û tevî 12 kesan komekê ava bikin.

Komê ji dema damezirandina wê ve beşdarî tevahî çalakiyên neteweyî bû, çi li hundirê Rojava yan jî derveyî wê, heta bi Lubnanê û Akademiya Şehîd Mahsûm Korkmaz de.

### 'KOMA KALAN'

Navê komê destpêkê 'Koma Kalan' bû, ji ber ku yên di komê de temenmezin bûn.



Lê piştî hunermend Hozan Serhed di 22.07.1998`an de di êrişeke dewleta Tirk a dagirker de şehîd bûbû, ji bo hewldanên şehîd ên gihandina dengê şoreşê ji gel re û teqeziya li ser pêkanîna rêça wî ya hunerî endamên komê biryar da ku navê komê bikin Koma Şehîd Serhed.

### DÎLANÊN XWEDÎ WATE Û ÇÎROK

Kom li ser bi dehan dîlanên folklorîk dixebite û her dîlanek xwedî çîrokek e. Ji wan dîlanan;

Kenarê Rêkê: Naveroka wê çîrokê ew e; hin kes li kenarê rê ne û hevsengiyê çêdikin da ku nekevin xwarê.

Gulê Weynar: Çîroka vê ji keçeke bi navê Gulê hatiye. Yekî temenmezin li gund e, hewl dide wî îqna bike ku pê re bizewice. Ew çîrok bi rêya pêşandana dîlanên ferdî li dora endamên din ên komê tê şîrovekirin.

Sancî: Di dîlanê de kesek xwarinê dixwe, piştre nexweş dibe û nikare dîlanê bigerîne.

Fewzî Osman destnîşan kir ku kom dikare zêdetirî 28 dîlanên folklorîk ên çanda Efrînê pêşkêş bike û niha nifşê nû bi rêya dewreyan ji kesên nû tev li kom dibin û perwerde dikin.

### ROLA JINAN DI KOMÊ DE

Li ser rola jinan ji endamên komê Rengîn Ehmed got tev li komê bûn da ku rêya zanakirina civakê û girêdana wê bi mîras û adetên xwe li dijî şerê taybet ê li dijî herêmê temam bikin.

Rengînê got ew dîlanên folklorîk di şahiyan de pêşkêş dikin û welatiyan li ser vegera li mîrasê teşwîq dikin.

Sudoku: Bersiv 93

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 4 | 2 | 9 | 6 | 8 | 1 | 3 | 7 |
| 3 | 9 | 1 | 4 | 2 | 7 | 6 | 8 | 5 |
| 6 | 7 | 9 | 5 | 3 | 1 | 4 | 2 | 9 |
| 9 | 8 | 3 | 6 | 7 | 4 | 5 | 1 | 2 |
| 2 | 5 | 7 | 1 | 8 | 9 | 3 | 6 | 4 |
| 4 | 1 | 6 | 3 | 5 | 2 | 9 | 7 | 8 |
| 1 | 2 | 5 | 7 | 9 | 3 | 8 | 4 | 6 |
| 7 | 6 | 4 | 8 | 1 | 5 | 2 | 9 | 3 |
| 8 | 3 | 9 | 2 | 4 | 6 | 7 | 5 | 1 |

Sudoku:Pirs 94

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 1 | | | 7 | 3 | 6 | | 9 |
| 9 | | | | 5 | 6 | | | |
| | 3 | | | | 9 | | | 1 |
| 2 | 6 | | | | | 1 | | |
| | | 5 | | | | 3 | | |
| | | 7 | | | | | 8 | 4 |
| 3 | | | 6 | | | | 2 | |
| | | | 7 | 3 | | | | 5 |
| 8 | | 1 | 2 | 9 | | | 3 | |

# FERHENGA BIWÊJAN

## Di ziman de girîngiya biwêjan

Di zimanekî de pirbûn, xurtbûn, dewlemendbûn û rengînbûna biwêjan tê wê wateyê ku ew ziman jî zimanekî kevnar, xurt û dewlemend e. Bi taybetî di wêje, helbest, çîrok, roman, destan û stiranan de, biwêj xwediyên cihekî taybet in. Berhemên wêjeyî -çi devkî, çi nivîskî-, eger bi biwêjan neyên xemilandin û xurtkirin, çenda hêja û bedew bin jî dîsa wê kêm û lewaz bimînin. Di çîrokan de dema ji bo lehengê wê tê gotin; Geriya heta ku ji pêlavê ma simik, ji kopal ma kefik, di xeyalê guhdar, yan xwendevan de dîmenê gera wî ya bi salan tîne ber çavan.

Dema biwêj li guhê guhdar dikeve, guhdar hem di binê bandora axaftinê de dimîne, hem biwêj guhdarê xwe ber bi xwe ve, ber bi dîrokê ve dikişîne. Ji bo mirovekî merd, dema tê gotin; Hesp û qesp li cem yek in, camêrî û merdbûna wî weke neynikê tê ber çavê mirov. Li aliyê din, carna mirov bi biwêjan bi awayekî pir nazik û hosteyî tên şiyarkirin. Di civatan de dema yek bi nebaşî behsa yekî ne li wir dike, yan jin li wir hebin lê xwediyê axaftinê haya wî ji wan nebe, ji bo ku wê mijarê bibire, yek dengê xwe dike, dibêje; Dinya ewr e. Weke din dema keyfa yekî pir xweş be, dibêjin; Sivorî li ser simbêlên wî dilîzin, yan Şûr simbêlên wî nabirin. Gelo, ku ne bi biwêjên wiha be, kîjan peyv hene ku keyfa wî bi vî awayî bînin ziman. Bi kurt û kurmancî, mirov dikare bêje ku axaftina bêbiwêj mîna xwarina bêxwê û bêrûn e. Ji bo zimanekî jî windabûna biwêjan windabûna xemil û cewherê wî ye. Dema biwêj winda dibin, tenê bi serê xwe winda nabin naçin; ji çand, ziman, nirxên civakê, ji dîrokê û ji mirovayiyê jî her yek parçeyekî bi xwe re dibe. Windabûna biwêjan windabûna parçeyekî mirov e.

### Bandora biwêjan di wêjeyê de

Biwêj cewherê axaftinê ye. Carna peyameke sergirtî ye. Weke zêrê helandî ye. Ji peyvên zêde daweriviye û di axaftinê de dermanê herî bibandor e. Ji bo bûkê, ka xemil û xêl tên çi wateyê, ji bo axaftinê jî biwêj tê wê wateyê. Di dereceya herî jor de axaftinê şîrîn dike. Ti gotin cihê biwêjê nagirin. Hin biwêjên wisa hene ku li şûna wan ku tu pirtûkekê jî binivîsî, dîsa cihê wan danagire, wê wateyê nade û bi qasî wan bandorê nake. Ji bo kesê xizan dema tê gotin "Zarokên wî şûjinê dialîsin", rewşa wî weke neynikê tê ber çavan.



Rêwiyê riya azadiyê R-6

## Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa vejîna jinê ye



Şoreşa 19`ê Tîrmehê ji bo gelên herêmê û bi taybetî ji bo jinan bû destpêka vejîneke nû, berdevka Kongra Star a bakur û rojhilatê Sûriyê Rîhan Loqo diyar kir ku Şoreşa Rojava bi deng û rengê jinê li tevahiya cîhanê deng veda.**R-2**

## Li hemberî dorpêçê gel li ber xwe dide



Sucên dorpêça Hikumeta Şamê li ser gelên herêma şehbayê berdewam e. Di şert û mercên zehmet ên demsala havînê de tunebûna sotemenî, kehrebe û derman, rewşa welatiyan hîn zehmetir dike. **R-5**



Rejîmên Tirk Û Rûs Şiklê Têkîliya Kirêt In
Idrîs Henan R-5

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1084 | 23-Tîrmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# ŞOREŞA 19'Ê TÎRMEHÊ WÊ SERKEFTIN Û ÇARESERIYÊ MISOGER BIKE



Hesen Koçer da zanîn ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê li ser bingehê tekoşîna 50 salî ava bûye û destnîşan kir ku beriya şoreşê bi 2 salan xebatên avakirina rêxistinkirina civakê û avakirina pergala parastinê hatibû destpêkirin. Koçer, diyar kir ku gelek alî êrişî şoreşa Rojava Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikin û dixwazin wê tune bikin, lê bi hevgirtina civakî gelê herêmê karîbûn destkeftiyên xwe biparêzin.**R-4**



## 'Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa ked û afrandinê ye'



Xebatên şaredariyên herêma Cizîrê bi destpêka Şoreşa 19`ê Tîrmehê re, xebatên bingehîn bûn. Têkildarî kar û xebatên şaredariyan li herêma Cizîrê, Bêrîvan Umer da zanîn ku damezirandina şaredariyan ji ber rewşeke awarte bû û niha kar û xebat birêxistinkirî dimeşin.**R-6**

## Pêdivî bi şoreşa çandî heye

Abdullah Babat 30 salan di hepsê de ma û piştre jî li Akademiya Huner a Aryenê dest bi perwerdeyên şêwekariyê kir. Ew dibêje, "Dema hûn şoreşekê dikin, hûn mecbûr in di warên çand û huner de jî şoreşê bikin."**R-7**



## Êrîşên dagirkeriya Tirk li ser Qadên Berxwedanê bi hevkariya PDK'ê

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku artêşa Tirk a dagirker li dijî qadên Zap û Metîna yên ku zivistanî jê reviya bû êrîşeke nû ya dagirkeriyê da destpêkirin. Gerîlayên Azadiya Kurdistanê jî bi çalakiyên xurt bersivê dide êrîşan.**R-3**



# Şoreşa 19’ê Tîrmehê şoreşa vejîna jinê ye

**Şoreşa 19`ê Tîrmehê ji bo gelên herêmê û bi taybetî ji bo jinan bû destpêka vejîneke nû, berdevka Kongra Star a bakur û rojhilatê Sûriyê Rîhan Loqo diyar kir ku Şoreşa Rojava bi deng û rengê jinê li tevahiya cîhanê deng veda.**

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Şoreşa 19’ê Tîrmehê ku bi pêşengiya jinan dest pê kir û ji tevahiya cîhanê re bû sembola azadiyê, di nava 12 salan de, gelek destkeftiyên jinan mayinde kir û bû mîrasa dîrokî ji têkoşîna jinan re. Herwiha gelên Rojava bi Şoreşa 19’ê Tîrmehê re bûne pêşengên ezmûneke girîng a guhertin û veguhertina demokratîk, lewra bûne hêzeke aktîf, di her astê de û heta niha jî têkoşîneke girîng didin meşandin. Gelên Rojava di ber tevahiya cîhanê şerê parastina mirovahiyê kir û ji bo wê armanc gelek qurbanî da. Jinên Rojava jî ji tevahiya jinên cîhanê re bûn sembola berxwedan û azadiyê.

Derbarê salvegera Şoreşa 19’ê Tîrmehê û rola jinê di şoreşê de, berdevka Kongira Star a bakûr û rojhilatê Sûriyê Rîhan loqo ji rojnemeya mera axivî.

Rîhan loqo da xuyakirin ku li kêleka jinên kurd , jinên ereb jî cihê xwe di nava Şoreşa Rojava de girtin û wiha got: “Yekemîn rêxistina jinan li ser asta Rojava hat avakirin, Yekîtiya Star bû, ku di sala 2005’an de hat damezrandin û piştê wê navê hat guhertin û bû Kongra Star, vê kongreyê yekîtiya komînal di nava jin û civakê de avakir. Di heman demê de bi pêşenegtiya jinên kurd, ereb, suryan û tevahî pêkhateyên bakûr û rojhilatê Sûriyê ku tevlîbûn, ev jî



bû sedema avakirina bingeha civakeke demokratîk û wekhev. Herwiha piştê Şoreşa 19’ê Tîrmehê bi dehan rêxistin û tevgerên jinana hatin avakirin. Mînak wê jî, ji bo jinên ereb li herêmên rizgarkirî wekî Dêrezorê û Reqa yê koma Zenûbiya hat avakirin, ev jî destkeftiyeke pir mezin bû ji bo şoreşê, destkeftiyên heyî bi destê jinên herêmê hatin bidestxistin.”

**` Şoreşa Rojava bi pêşengiya jinan li tevahiya cîhanê deng veda`**

Rîhan Loqo diyar kir ku di Şoreşa 19`ê Tîrmehê de, jinê nasnameya xwe îsbatkir û rolela pêşengtiyê girt ser milê xwe: “Di demên berê de dihate zanîn ku rêjîma baisê li Sûriyayê pir desthiladar bû, dixwest ku civakê li gorî zhniyeta xwe ya qirêj ava bike, ji wê herdem hewil dida ku tirsê di nava gel de ava bike. Her wiha şerekî taybet li ser jinê dida meşandin, ji ber ku dizanibû ku rola jinê di civakê de pir girîng e. Tevahiya desthiladaran piştî avabûna sîstema dewletê, jin çewisandine û xwestine jinê bê vîn bihêlin, da ku desthilatdariya xwe ya li ser civakê dewam bikin.”

Rîhan wiha berdewamî da axavtina xwe û got:”Jina Kurd a ku ji destpêka şoreşê ve, bi cewherî pêşengiya şoreşê kir, bi xebata xwe karîbû leza têkoşîna xwe ya demokratîk, rêxistinî, diplomatîk,




siyasî, çandî û abûrî bilind bike, herwiha ji bo hemû jinên cîhanê bibe mînak. Jinan bi pêşengiya rêxistina Yekîtiya Star xwe li Rojava û hin bajarên Sûriyeyê bi awayekî balkêş bi rêxistin kirin, li hemû gund û bajarokan komîn û meclisên jinan hatin avakirin. Her wiha ji bo perwerdekirina jinan di hemû qadên jiyanê de gelek çalakî li darxistin. Ji bo vejandina zimanê Kurdî, pêşxistina wêjeya Kurdî li Rojava jî herî zêde keda jinan hebû. Jinên Kurd bi têkoşîn û berxwedana xwe ya di nava şoreşê de, li ser asta cîhanê deng veda.”

**‘Jinê di hemû warê jiyanê de xwe isbat kir’**

Rîhan da zanîn ku têkoşîna jinan ne tenê bi xebatên sivîl re sînordar bû, lê jinan li Rojava bi avakirina Yekîneyên Parastina Jin YPJ`ê û avakirina rêxistinê di warê ewlehî, tevlîbûna pergala parastina Rojava de, destkeftiyên girîng bi dest xistin û wiha domand:”Yekîneyên Parastina Jin ku avakirina wan di destpêka şoreşa Rojava de hate ragihandin, beşdarî hemû qonaxên şerê li dijî çeteyên DAIŞ`ê bû û serkeftinên mezin bi dest xist. Bi sedan jin ji bo parastina nirx û destkeftiyên jinan gihiştin asta şehadetê. Şehîd Arîn Mîrkan a ku bi ruhê xwe efsaneya serdemê nivîsand, bû mînaka jina têkoşer. Yekîneyên Parastina Jin di dîroka şoreşa Rojava de roleke sereke û girîng lîst û beriya her tiştî ev şoreş veguherand şoreşa jinê.”

**‘Şoreşa Rojava şoreşa jiyanê ye’**

Rîha wiha axavtina xwe dewam kir û got:”Şaristaniya çandiniyê ku bi destê jinê hat afirandin, roleke sereke di avakirina şaristaniyan de lîst, lê ev destkeftiya ku xizmeta tevahiya mirovahiyê dike ji destê wan hat girtin. Li Rojava geşepêdana di vî warî bi awayekî berçav bi avakirina koperatîfan û çandiniyên taybete bi jinan, ji bo peydakirina derfetên kar ji jinan re, hat pêşxistin. Ji ber vê yekê Şoreşa 19`ê Tîrmehê şoreşa jinê ye, şoreşek cewherê jinê ye, hemû qadan, bi hemû wateya xwe şoreşeke pîroz e. Weke ku em dibînin dewletên dagirker şerê xwe li ser me zêde dike û bi taybet li ser jinên pêşeng, ji ber ku dizanin pêşketina vê civakê jine, timî jinan hedef digrin.”

Rîhan Loqo berdevka Kongra Star wiha axavtina xwe bi dawî kir: “Di serî de em dibêjin ku şoreşa Rojava şoreşa jinê ye. Li ser vê bingihê em salvegera 19`ê Tîrmehê li jinên pêşeng yên ku canê xwe feda kirin,pîroz dikin, herwiha em soza şopandina riya doza wan dûbare dikin.”

# Jinên kedkar

**Nehîr Pale**

**Piştî ku şoreşa Sûriyeyê dest pê dike, 4 xwişk tev dayika xwe, di sala 2012`an ji Helebê derbasî Reqa dibin. Ji taxa Sukeriyê ya bajarê Helebê ne, piştî ku bavê wan wefat dike, bi hev re dibin alîkar û debara jiyana xwe bi xwe dikin.**

Gurûpa din jî ku hejmara wan 4 kesin ji malbatekê ne, du xwiş û biraziyên xwe ne. Yek ji wan xwişkan Xalîse El-Şehade ji ber wê û hevjînê xwe li hevdû nekirine, ji hevdû veqetiyane û niha li gel malbata xwe ye. Ew ji gundê Eyaş ê Dêra Zorê ne koçberî gundê kesra yê gundewarê rojavayê Dêra Zorê bûne. Her du xwişk Aye Remedan El-Şehade û Cewahir Remedan El-Şehade ji Dêra Zorê hatine gel metikên xwe Eyşe El-Şehade û Xalîse El-Şehade li Reqayê cotkariyê dikin. Eyşe û Xalîse jî ev 5 sale derbasî Reqayê bûne û li gel dayîka xwe ne, bavê wan wefat bû ye û her fêr bûne berpirsyartiya xwe û ya malbata xwe bikin. Yek ji wan dibistana seretayî xwendiye, dudu ji wan jî heyanî dibistana navîn xwendine û yên dîtir jî qet neçûne dibistanê. Niha fêrî cotkariyê bûne û kîjan jin dixwaze fêr bibe û bixebitê bi wan re dibin alîkar.

**Cotkariyê fêm dikin û xwe baş birêxistin dikin**

Bexçeyê ku tê de dixebitin li gundê Kesra Cûma yê Reqayê ye, 25 donime û her 4 demsalan (Zivistan, Buharê, Havîn û Payîzê) diçînin. Her teşeyekî zebze li gorî demsala wê diçînin, êdî di çandiniyê de bûne xwedî tecrubeyekî mezin, ew xwe birêve dibin û xwe birêxistin dikin, saet 05:00 têne nava bexçe




heyanî saet 12:00 dixebitin. Zebze diçînin, derman dikin û paqij dikin. Dema ku bexçe berhem dide jî ew zebze berhev dikin û rêdikin bazarê.

Cotkarên jin li gorî saetên kar, pere digirin, her saetekê 2000 L.S. digrin. Her wiha ji zebzeyên bexçe sûdwerdigrin û ji berhema destê xwe dixwin.

**Têkiliya wan a civakî xurte**

Jinên cotkar xebatên xwe yên bexçe birêxistin dikin. Bi hevre dixebitin, bi hevre navber didin û bihevre çaya xwe vedixwin. Cûdahiya temen bandor li ser têkiliya wan nake, Eyşe El-Şehade mezine û temenê wê 40 salî ye û biraziya wê Cewahir 12 salî ye xwikşa wê jî Aye 13 salî ye. Di gurûpe de her kes pêkve dixebite û tu pirsgirêk di navbera wan de dernakevin. Ew ne tenê aliyê aborî ve berpirsyartî radikin, karê malê jî dikin û xwe birêve dibin.

**Çanda xwe ya çandiniyê diparêzin**

Xebtandina jin a di çandiniyê de çandeke ku ji berî zayînê 10000 sal ji aliyê jin ve hatiye îcad kirin û niha diparêz in. Li xaka Mezepotamiya bi riya jin şoreşa çandiniyê dest pê kir û heyanî roja îro didome. Li van herêman bi giştî jin berpirsyartiya çandiniyê radike û mêr jî avdaniyê dikin û berhema çandiniyê dibin bazarê.



# Pêdivî bi şoreşa çandî heye

**Abdullah Babat 30 salan di hepsê de ma û piştre jî li Akademiya Huner a Aryenê dest bi perwerdeyên şêwekariyê kir. Ew dibêje, “Dema hûn şoreşekê dikin, hûn mecbûr in di warên çand û huner de jî şoreşê bikin.”**

Abdullah Babat, sala 1992’yan li Wanê bi îdiaya “endamtiya rêxistinê” hate girtin û 30 salan di hepsê de ma. Di 15’ê Nîsana 2022’yan de jî tehliye bû. Babat, niha li Akademiya Huner a Aryenê perwerdeya nîgarkêşiyê dide ciwan û zarokan. Babat, li girtîgehê hînî nîgarkêşiyê bû û di nava 30 salan de hunerê xwe bi pêş xist û niha jî vê tecrûbeya xwe bi ciwanan re parve dike. Babat got, hem perwerdeyê dide hem jî hîn dibe. Babat, pirraniya dema xwe li atolyeyê derbas dike û heta niha bi sedan tablo çêkirine.

Babat piştî ku 19’ê Nîsana sala 1992’yan li Wanê hat binçavkirin, hat girtin. Paşê jî ew li hepsên Wan, Amed, Mûş, Çankiri û Tekîrdagê girtî ma. Babat, Girtîgeha Çankiriyê ji bo xwe weke “dibistan, zanîngeh, cihê ez lê mezin bûme” pênase dike û bingeha xebatên xwe yên



çand û hunerê jî li vir ava dike.

**Bob Ross meraqa wî zêdetir dike**

Babat, wiha qala wê pêvajoyê dike: “Ez hem li wir (Çankirî) mezin bûm hem jî têgihiştina min bi pêş ket. Bandoreke mezin a wê girtîgehê li ser min çêbû. Elaqeya min a ji bo çanda Kurdî, dengbêjî, muzîk û folklorê wê demê dest pê kir. Di 17 saliya xwe de hatim girtin. Ciwantiya min li Çankiriyê derbas bû û hemû aliyên min ên hunerî jî li wir bi pêş ketin. Dema li girtîgehê di ekîba folklorê de min cih digirt. Min li wir xwe di qada çand û huner de bi pêş xist. Piştre jî hatim girtîgeha Mûşê. Hevalên li wir nîgar çêdikirin. Min jî firçeyên wan dişûştin, li cem wan disekinîm û min hewl dida hîn bibim. Wê demê li ser televîzyonê nîgarvan Bob (Ross) hebû û bandoreke mezin li min dikir. Bernameya wî 40 deqe bû û hefteyê carekê bû. Û min li hemû bernameyên wî temaşe kirin.”

**Hem hîn dibe hem jî fêr dike**

Abdullah Babat qebîliyeta xwe ya çêkirina nîgaran li girtîgehê bi pêş xist. Herî dawî sirgunî Girtîgeha Tekîrdagê hate kirin û heta roja tehliye bû jî her tim wêne xêz kirin. Piştî ku hat berdan, ew çû Akademiya Huner a Aryenê û dest bi dayîna dersê kir: “Min her tim dixwest resman çêkim. Heke careke din bêm dinyayê, dê bala xwe bidim ser resman û vê bikim. Piştî girtîgehê hatim Aryenê. Hem hîn dikim, hem jî hîn dibim. Dixwazim demek piştre pênûsrejiyê bikim û hunera xwe hinek pêş bixim.”

**Şoreş bêyî huner wekî mirovekî seqet e**

Babat dibêje, şoreşa Kurdan nekarî bi xwe re şoreşeke çand û hunerî bîne û divê ev mijar her tim mijara xwerexnekirinê be: “Civakeke bê huner, nayê qebûlkirin. Têkoşîneke 50 salan heye, berdêlên giran hatin dayîn lê me nekarî vê têkoşînê bi huner re bînin ba hev. Heke di şoreşê de tu nikarî aliyên wê yên çand û huner xurt bikî, ew ê mîna mirovekî seqet bisekine. Ji bo me ev yek cihê xwerexnekirinê ye. Heke hûn tevî ewqas berdêlan jî nikarin huner biafirînin, wê demê hêza we ya veguherandina civakê jî qels dibe. Şoreşa çand û huner jî yek ji mezintirîn şoreşan e. Dema hûn şoreşê dikin, hûn neçar in ku di warên çand û huner de jî şoreşê bikin. Weke mînak, di salên 90’î de Koma Berxwedan bandoreke pirr mezin çêkir ne wisa? Wî ruhî di nava ciwanan de ruhê şoreşê afirand. Em dibînin bê ka muzîk jî li ser civakê çiqas bi bandor e. Mixabin piştî salên 2000’î paşve ketin. Heke hûn bixwazin civakekê veguherînin, bêguman têkoşîn bingehê vê ye lê di vê veguherînê de bandora herî mezin çand û huner dike.”

**Pêdivî bi şoreşa zihnî heye**

Abdullah Babat wê dersên şêwekariyê bidomîne: “Li vir ji bo nîgarê elaqe heye. Ez jî bi qasî hêza xwe hem resman çêdikim hem jî hîn dikim. Hewcehî bi şoreşa zêhniyetê heye. Ji bo vê jî hewce ye civak têbikoşe. Di navbera salên 90’î û 2000’î de pirr ferq heye. Dema em diçin malekê, ciwanekî piştî salên 2000’î ji dayik bûyî li quncikekê rûdine, bi telefonê û tiştên pirr cuda mijûl e, lê yên salên 90’î li ser siyaset û çandê diaxivin. Dev ji civakê berde, heta di navbera kesên malê de jî ferq û cudahiyeke ewqasî mezin çêbû. Ev yek jî min pirr diêşîne. Divê ji bo sererastkirina vê rewşê her kes hewl bide. Ez ji hevalên xwe yên li girtîgehê re silavan dişînim û min gelek bêriya wan kiriye.”

# Bi hunera xwe çandên cûda tîne gel hev

**Nazanîn Abdullah a bi amûrên ku nayê karanîn şêweyek nû dide û çandên cûda bi hunera xwe re dike yek, dibêje: “Hinek caran ez ew amûrên ku tên avêtin bikartînim, ji ber wê ez daxwazê ji hemwelatiyan dikim ku ew amûrên bi karneynin ne avêjin.”**

Hunermend Nazanin Abdullah ku li bajarê Silêmanî yê Başûrê Kurdistanê jiyan dike bi berhemên xwe ên hunera cûda bala kesên ku ji hunerê hez dikin dikêşe. Nazenîn Abdullah diyar kir ku ji 12 saliya wê ve ev kêrhatiya wê derketiye holê, bi berhemên ji seramîk, kevir, kulîk û amûrên din bi kartîne berhemên xwe di galariya xwe de pêşan dide.

**‘Hemû berhemên min fikir û dizayna min e’**

Nazanîn Abdullah da zanîn ku cihana hunerê gelek befireh û kûr e, û got: “Hunera ku ez pêre mijûl dibim jêre xebatên bi hurgulî pêwîste, ji ber wê jî dema em biryar didin ku berhemekê çêkin kedek mezin jêre pêwîste û divê em xwe pêre bikin yek. Hemû berhemên min ji fikir û şêweyên min pêktê. Gelek caran li gora daxwazên kesên ku ji hunerê hes dikin berheman çêdikim. Ji karê ku ez dikim re



gelek hurgulî lazime û ji ber wê jî ez gelek ji karê xwe hez dikim.”

**‘Hinek amûrên ez bikartînim li Kurdistanê peydanabin’**

Nazanîn Abdullah destnîşan kir ku hewl dide çandên cûda bîne ba hev û wiha got: “Dema ez berhemên xwe çêdikim ez kedek mezin didim û xebatek ku dem pêve derbaz dibeye. Hinek caran şert zehmet dibin, ji ber ew amûrên ku ez di berhemên xwe de bi kartinîm li Kurdistanê peyda nabin û ez neçar dibin ji derveyî welat bixwazim. Lê rûxmê hemû zoriyan jî ez berhemên xwe ên hunerê çêdikim.”

**‘Eleqeya jinan zêdetir e’**

Nazenîn Abdullah bi bîrxist ku hemû kesên civakê serdana galariya wê dike, lê belê eleqeya jinan zêdetire û got:“Hinek caran dema ku ez berhemên xwe çêdikim ez amûrên ku tên avêtin bi kartînim. Ji ber vê jî ez daxwazê ji hemwelatiyan dikim ku ew amûrên xwe ên ku bi karneynîn ne avêjin.”


**NÛ JINHA**

# ‘Wêjeya Kurdî dewlemend e’

**Nivîskara Rojhilatî Sayîme Xakpûr anî ziman ku wêjeya Kurd yek ji wêjeyên herî dewlemend ên cîhanê ye û got, “Lê belê wêjeya Kurd bi salan e tecrîdkirî ye û piraniya Kurdan haya xwe ji vê xezîneyê nîne.”**

Nivîskar Sayîme Xakpûr bal kişand ser tecrîd û asîmîlasyona li ser wêjeya Kurd û destnîşan kir ku haya gelek Kurdan ji vê xezîneyê nîne.

Sayîme Xakpûr ku li bajarê Ûrmiyê



yê Rojhilatê Kurdistanê ji dayik bû, li ser ziman û wêjeya Kurdî dixebite; nivîsan amade dike, wergerê dike. Xakpûr ku gelek pirtûkên Kurdî wergeran Farsî, naveroka piraniya berhemên ku wergerandiye li ser mijarên dîrok û dengê civaka Kurd, rewşa Kurdan a li Rojhilata Navîn a ji sedsala derbasbûyî û vir ve, her wiha berxwedana Kobanê ye. Nivîskar Xakpûr ku ji bilî wergerê çîrokên kurt jî dinivîsîne, herî dawî li ser jiyana stranbêjeke Rojhilatî ya bi navê ‘Îran Xanim’ karekî berfireh kir û weşand.

Xakpûr got ku wêjeya Kurd yek ji wêjeyên herî dewlemend ên cîhanê ye. Xakpûr diyar kir ku piraniya nivîskarên li cîhanê xwe ji parastina ziman, wêje û çanda gelê xwe berpirsyar dibîne û destnîşan kir ku yên radihêjin pênûsê di heman demê de radihêjin barê civakê.

Xakpûr anî ziman ku Rojhilat dergûşa çand, huner û wêjeya Kurd e û got, “Li gel zaravayên Hewramî, Kelhûrî û Lekî, ji Ûrmiyê heta bi Mako û Selmasê, Kalaxwe Îlam, Kirmaşan û Xorasanê karên li ser ziman, çand, huner û wêjeyî bi rengekî yekgirtî têne meşandin. Di vê serdemê de ku bi taybetî li ser medya dîjîtal mirov di nava danûstandinan de ye, eleqeya ji bo wêje, çand û hunerê jî zêde bûye.”

**Berxwedana li dijî asîmîlasyonê**

Xakpûr destnîşan kir ku wêjeya Kurd yek ji wêjeyên herî dewlemend ên cîhanê ye û got, “Wêjeya Kurd bi salan e tecrîdkirî ye û haya gelek Kurdan ji vê xezîneyê nîne. Li dijî polîtîkayên asîmîlasyonê lêkolîn têne kirin û li hemberî asîmîlasyonê berxwedaneke xurt heye.”

# ‘Şoreşa 19’ê Tîrmehê şoreşa ked û afrandinê ye’

Xebatên şaredariyên herêma Cizîrê bi destpêka Şoreşa 19`ê Tîrmehê re, xebatên bingehîn bûn. Têkildarî kar û xebatên şaredariyan li herêma Cizîrê, Bêrîvan Umer da zanîn ku damezirandina şaredariyan ji ber rewşeke awarte bû û niha kar û xebat birêxistinkirî dimeşin.

**Reşo Mihemed/Qamişlo**

Li Rojavayê Kurdistanê piştî ku di 19’ê Tîrmehê de gel rêveberiyên bajaran bidest xistin û dest bi avakirina sîstema xweseriya demokratîk kir, xebatên şaredartiya gel ku yek ji lingên esasî yên vê sîstemê ne jî, roj bi roj berfirehtir bûn. Şaredariyên gel ji bo rêvebirin û pêşkêşkirina xizmetguzariyê chêreng ji civakê re, xebatan rojane yên girîng dan meşandin. Karên ku dike jî weke karê şopandin û çakkirina rewşa paqijî û ava bajaran û pê ve girêdayî xebata navçe û komînên gundan. Di heman demê de şaredarî bilindkirina asta ekolojî, çêkirin û sazkirina rê û kolanan jî dixe nav pilanên xwe de.

Yek ji bajarên herê mezin yên Rojavayê Kurdisatnê jî, bajarê Qamişlo ye, şaredariya bajarê Qamişlo di 10`ê Kanûna 2012`an de bû xebata yekê li ser asta Rojava. Êdî bi demê re şaredariya navçeya Amûdê, Hesekê û hemû navçeyên herêma Cizîrê hatin damezrandin û xebat hatin meşandin.

Herwisa di 18`ê gulana 2013`an de Konfransa Damezrandinê ya şaredariyên bajar û navçeyên Rojava hat lidarxistin. Di encamê de jî gelek şaredarî hatin damezrandin. Di heman demê de jî bi 10`an biryarên girêdayî sîstema xebatê û rêziknameya her şaredariyekê hat sazkirin.



**Bêrîvan Umer**

Yek ji van biriyaran avakirina Akadimiya Perwerdeyî ji bo perwerdekirina endamên şaredariyan bû. Di heman demê de navên gund, navçe û bajarên kurdan yên ku rêjîmê guhendibûn zimanê erebî, bi biriyara vê konfransê vegeriyan koka xwe. Li aliyekî din jî, pêkanîna lêkolînên derbarê çavkanî û cihên berhemdayînê li herênma Cizîrê jî, ji biriyarên Konfransa Damezrandinê bû. Ji bilî van biriyaran gelek biriyarên din jî hatin giritin.

Di dema niha de hejmara şaredariyên li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê 132 şaredarî ne, yên herêma Cizîrê dighêjin 57 şaredariyan, herwiha 5 hezar û 172 karmend di van şaredariyan de kar û xebatên cuda dikin. Desteya Şaredariyên herêma Cizîrê li ser tevahiya kar û xebatên rêxistinî yên van şaredariyan disekine.

Herwiha 13 komîte, nivîsgeh û rêveberî dikevin bin sîwana şaredariyên herêma Cizîrê, weke Gerînendeya Avê, Komîteya Jenetoran, Nivîsgeha Jinê û... hwd.

Têkildarî xebatên şaredariyên herêma Cizîrê bi pêşveçûna Şoreşa 19`ê Tîrmehê re, cîgira hevseroka Desteya Rêveberiya Herêmî ya herêma Cizîrê Bêrîvan Umer ji Rojnameya “Ronahî” re axivî

.

**‘Kar û xebatên Şaredariyan ji bajarê Qamişlo’**

Bêrîvan Umer dazanîn ku damezrandina şaredariyan li herêma Cizîrê, ji bo welatiyan bi awayekî awarte bû û wiha anî ziman: “Bi destpêkirina kîrza Sûriyê re êdî rêjîma Sûriyê karê hemû saziyên xwe da rawestandin. Di heman demê de rewşa herêma Cizîrê weke ya hemû herêmên din bû. Wê demê navçe û bajarên me ber bi rewşeke pir lawaz ve çû, gelek çop li kolanan avêtî bû û gel ji hemû pêdiviyên jiyanê hatibû mehrûmkirin. Lê bi gavên destpêkê yê Şoreşa 19`ê Tîrmehê re, ev rewş weke xwe nema. Me kar û xebatên xwe ji bajarê Qamişlo dest pê kirin. Destpêkê nêzî 7 komîte li Qamişlo hatin damezrandin. Herwiha damezrandina van komîteyan ji ber rewşeke awarte bû ku bi riya wan jî pêdiviyên gel, ji bo wan hatin bidestxistin. Bi domana demê re ev komîteyên li Qamişlo tev bûn şaredariyek. Di heman demê de jî şaredariyên hemû navçe û bajarên herêma Cizîrê û herêmên din hatin damezrandin. Piştî Rêveberiya Xweser hate damezrandin şaredarî li hemû herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê hatin damezrandin.”

**‘Şaredarî ji bona xizmeta gel hatin avakirin’**

Bêrîvan diyar kir ku kar û xebatên şaredariyên herêma Cizîrê ji bo gelê wê ye û wiha domand: “Me weke



Desteya Şaredariyên Herêma Cizîrê ji destpêka damezrandina şaredariyên herêma xwe, heya roja îro hertim xebat ji bo gel kiriye. Bi armanca pêkanîna pêdiviyên gelên herêmê yên xizmetguzarî, çakkirina rewşa ekolojî û paqijkirina bajar û navçeyan, me gelek piroje birine serî. Herwiha şaredariyên hemû bajar û navçeyan li gor derfet û şiyana xwe pirsgirêkên mezin çareserkirin. Wekî din jî kar û xebatên rojane weke paqijiyê, hewildana peydakirina avê ji bo gel bi awayekî durist û çakkirina rewşa ekolojî û xizmetguzarî berdewam e. Lê di heman demê de herêma Cizîrê rastî pirsgirêkan jî dibe, weke pirsgirêka avê ya bajarê Hesekê ye. Ev pirsgirêk ji dema ku dagirkeriya Tirk herêma Serê Kaniyê dagir kir û ava meheta Elok li ser Hesekê Qut kir. Dagirkeriya Tirkiyê ava ku tê bajêr bi carekê de qut kir. Ji bo ku pirsgirêka ava bajarê Hesekê bi carekê de çareser bibe, me dest bi pirojeya çareseriyê kir û niha em li ser kar dikin. Hertim jî ji bo çakkrina rewşa xizmetguzariyan li tevaya herêma Cizîrê xebata me ji bo gel ranaweste.”

# Rêwiyê riya azadiyê...(1)

**Fehîma Deştan**

Bangewaziya kurdekî azad. Huseyîn Şawîş koçerekî bi bayê bilindiyan re, li seranserî axa Kurdistanê deng û pêjna xwe vedaye. Milîtantî û pêşengtiya demê bêdudilî li hemberî dijbertiya şoreş, kevneperstiyê bi zarekî xweş, uslubekî eyan, sekineke diyar xwe li zehmetiyên jiyanê gebilandiye. Pênûsa xwe kiriye qasidê ruhê nepeniyên hevkariyê. Xwedî dil û mejiyekî zeryayî bû. Ji teorî û ezmûnên salan bi asoyek dagirtî tevgeriyaye. Aşqê çiya, zevî, deşt, zozan, xweza û bedewiya welatê xwe bû. Meya pêşengtiya demê kişandiye nav cerg û hinavên xwe. Pênûsa xwe hê ji zarokatiyê ve di nav genimê deşta Cizîra Rojava de tamijandiye. Reseniya dîrokê bi bîr û bawerî weke pêlên Dicle herikiye nav civakê. Li dijî hemû zor û zehmetiyan bi dirêjiya têkoşînê re li ber xwe daye. Civakeke azad di xeyal û rastiyê de jiyaye. Lêkolîn û nivîsên xwe spartiye berxwedana milîtanên di çeperên parastina rûmetê de. Bangewaziya gelên bindest li ser asîmanê dilê xwe hunaye. Bi dirêjiya jiyana xwe ya têkoşer re helwesta milîtanekî Apogerî nîşan daye. Qêrîn û wijdanê wekheviyê ji bo dahatuyê bi soz û qesem hildaye ser milan. Helbestên Cizîrî, Xanî û Feqê Teyran kizirandiye ser mêlakên xwe yên li nav lêgerînê de. Biratî, qencî, merdî, wekhevî bi find û fenerên heqîqetê ronî kiriye.



Navê malê Huseyîn Şawîş e. Navê tevgerê Herekol Dêrik, Îmam, Îmam Husên û Ebû Kawa ye. Di sala 1958’an de li gundê Qereçoxê (Beroj) yê girêdayî bajarê Dêrika Hemko ji dayîk bûye. Navê dayîkê Xedîca, navê bav Xelîl e. Di nava malbateke welatperwer, xizan bi reng û dengê çanda xwe ya koçeriyê asoya jiyana xwe vedaye. Li gund dibistana seretayî qedandiye, ji bo dibistana navîn derbasî bajarê Dêrika Hemko bûye, dibistana amadayî li bajarê Qamişlo qedandiye. Da ku zankoya zîreatê(çandiniyê) bixwîne berê xwe daye peytexta Sûriyê Şamê. Salên xwendevaniyê li ber dengê tekoşînên rizgariya gelan derbas kiriye. Dijberiya dagirkerî û emperyalîzmê di dil de jiyaye û li ser kûr bûye. Bi wê berteka li dijî mêtingeriyê ketiye nav lêgerînên şoreşgerî. Ji bo tekoşîna rizgariya gelê Kurd, lêgerîneke bêsekin bi ramanên kûr re jiyaye.

Di salên 1980’yê de, li ser teoriya rizgariya gelan, fikirên çepgir û komonîst di lêkolînên xwe de kûr bûye. Weke şoreşgerekî sînornenas bi gotina xwe ya” Li hemberî dagirkerî û emperyalîzmê li ku dibe bila bibe, divê helwest û tekoşîna me bi biryar û çalak be” ketiye nav tevgerê. Li ser rewşa Kurdistan û dagirkirina wê gelekî ponijiye. Ji bo tekoşîna azadiya Kurdistanê tevlî partiya Çepê Sosyalîst bûye. Bizav û tevgerên dijî dagirkeriyê ji nêz ve şopandiye. Bi rêgez û vînekî zelal parastina azadî, adalet, maf û wekheviyê li dijî hemû şêwazê dagirkeriyê rawestiyaye. Parastina azadî, maf û adaletê ji bo gelê xwe hunaye. Li ser rewşa rizgariya Kurdistanê bi hûrgulî hiziriye. Di ramanê xwe de helwest û hestên zelal jiyaye. Her ku ponijîn û fikirên xwe berdaye nav doza Kurdistanê, têkoşîna Partiya Çepê Sosyalîst û partiyên Kurdistanî yên wê demê, ji bo azadiya Kurdistanê kêm dîtiye. Nîqaş û şîrove li ser serpêhatiya dîroka Kurdan û ezmûnên heyî kiriye. Bêsekin û hedar lêgerîna xwe li ser tevgerên azadiyê şopandiye.

Di sala 1982’an de bi nasîna kadroyên PKK’ê têkoşîna azadiyê ji nêz ve şopandiye. Di heman salê de tekoşîna gelê Filîstînê û êrîşên li ser Lubnanê ji nêz ve şopandiye. Tevî hevalên xwe di serî de rêheval Îsamîl û Medenî di nav lêgerîna azadiya doza Kurdistanê de bûye. Ji bo raman û hestên xwe yên azadiyê û welatparêziyê, bi awayekî çalak tevgeriyaye. Wê demê di nav lêgerîna partiyên Kurdan de bûye. Lewra ji avakirina partiyeyekî zêdetir, bi zanebûn û şiyariya doza Kurdistanê re mijûl bûye. Li ser pirtûkên şoreşên cîhanê, riya sosyalîzmê û teoriya rizgariyê nîqaş û lêgerînên xwe xurt kiriye. Di sala 1983’an de hê zêdetir kadroyên tevgera PKK’ê nas kiriye û pirtûkên tevgera azadiyê ku hatibûn wergerandin xwendiye. Di sala 1984’an de bi nîqaşên li ser riya şoreşê, hê zêdetir fikir û ramanên partiyê ji bo doza Kurdan nas kiriye. Bi îdeolojî û ramanên Rêber Apo yên azadiyê bawer bûye. Berxwedan û helwesta milîtanên PKK’ê li zindana Amedê raber kirîn, li ser kesayeta wî bandoreke mezin kiriye. Tevgera PKK’ê rêka herî rast ji bo azadiya Kurdistanê dîtiye. Bîrûbaweriya xwe bi felsefeya Rêber Apo ya azadiyê aniye. Tevgera PKK’ê bersiva demê dîtiye. Bi koma yekemîn a ciwanên Rojava yên xwendekar re tevlî refên PKK’ê bûye. Di serî de weke sampatîzanê PKK’ê di nava xebatên rêxistinî û ciwanên xwendevan, propogandayê de cih girtiye. Piştî pêngava 15’ê Tebaxê ku li seranserî Kurdistanê dengvedan û hilatina vejînê bû, pêla xwe li Rojavayê Kurdistanê jî xistiye. Weke guloka berfê roj bi roj berfireh bûye û agirê azadiyê geş kiriye. Huseyîn Şawîş jî li qada Rojavayê Kurdistanê di asta milîtanekî rêxistinî de, bi belavkirina danezan, belavokên PKK’ê de bi awayekî çalak xebatê rêxistinî kiriye. Di sala 1985’an de bi pêşketina Eniya Rizgariya Netewa Kurdistanê ERNK’ê re, xebatên rêxistinî li gelek bajarên Rojava meşandiye. Di asta kadroyekî çalak de tevlî refên rêxistinê bûye û kar kiriye.

Di sala 1986’an de tevlî civînên Rêber Apo bûye. Ramanên Rêber Apo ji nêz ve şopandiye. Lewra rêka sereke ji bo tekoşîna Kurdistanê dîtiye. Di heman salê de ji bo dewreyeke perwerdê derbasî akademiya Mahsum Korkmaz bûye. Piştî perwerdê, di asta kadroyekî pêşeng de xebat li Şam, Cizîra Rojavayê Kurdistanê û derbaskirina komên gerîlan a ji çiyan re kiriye.



# Lozan amûreke tunekirina hêviyên gelan bû

Prof. Teysîr Ebdulcebar El Alûsî destnîşan kir ku Peymana Lozanê ji bo tunekirina hêviyên gelan, nexasim gelê Kurd û mafên wî yên diyarkirina qedera xwe, amûrek bû. El Alûsî ji bo rêgirtina li ber Lozaneke nû çareserî pêşkêş kirin.

**Navenda nûçeyan**

24’ê Tîrmehê, Peymana Lozanê dikeve sala xwe ya sedî ku heta niha gelên herêmê ji ber encamên wê êşê dikişînin.

Prof. Teysîr Ebdulcebar El Alûsî yê ji Iraqê, lihevkirin û peymanên di destpêka sedsala borî de hatine îmzekirin wiha nirxandin:“Divê em vê rastiyê destnîşan bikin ku lihevkirin û peymanên navneteweyî bi bandor û encamên xwe ve temamkirî ne. Em dibînin ku bingeha aliyên qanûnî yên van lihevkirinan, bi guhertinên serdema nûjen ve girêdayî ye.”

El Alûsî bal kişand ser Peymana Sykes-Picot jî û diyar kir ku ev peyman encamên Şerê Cîhanê yê Yekemîn û parvekirina milkên dewletên herêma Ereban û Rojhilata Navîn bû û got:”Ev peyman bû sedema parçekirina Ereban, xêzkirina sînorên dewleteke cudaxwaz ku bi xwe re nakokî û şer afirandin, li şûna ku bibûya lêvegereke herêmî ku herî kêm xemên hevbeş hilgire yan jî li gorî erkên navxweyî û derve yên herêmê, hewldan kiribana yek.”

El Alûsî wiha domand: “Li beramber peymana ku sala 1916`an derketiye, soz dan nûnerên şoreşa erebî û yên din. Peymana Sevrê hat îmzekirin. Lê em dê bibînin ku ev peymana sala 1920`an, encama teşhîrbûna Peymana Sykes-Picot bû û piştî demeke kurt dîsa bi rêya Peymana Lozanê ya duyemîn hat. Ev peyman ji bo tunekirina hêviyên gelan ên diyarkirina çarenûsa xwe û bidestxistina mafê welatekî serbixwe ya azad bi taybet Kurdan, bû amûrek. Kurd ketin xefika ku gelên herêmê jî ketinê.”



**‘Tirkiyê û gelek alî dixwazin propagandaya peymanên wiha bikin’**

El Alûsî wiha pê de çû: “Bi rastî hin alî hene hewl didin propagandaya bidawîbûna peymanê bikin tevî ku tu nîşaneyên vê yekê tune ne. Mebesta wan ne vegera Sevrê ye lê belê dixwazin rewşa hevsengiya tevlihev a niha, bi kar bînin, ji bo xewnên vegerandina împaratoriyê. Ev împaratoriya ku bi dîrokê re winda bû û bi belavkirina felsefeya Osmaniyê bi giyanê Îxwanî û ideolojiya cîhadê mir. Xwestin bi rêya vejandina dewleke olî yan jî dewleta xîlafetê rê li pêşiya xeyalên firehkirinê vekin. Ev dewlet dê careke din Rojhilata Navîn biçelqîne. Ji wir, mafê diyarkirina çarenûsê li ser Kurdan hat qedexekirin, hegemonyaya wan li ser Kurdan zêde bû. Dibe ku beşeke Îxwaniyan bi dest bixe ku piştgiriyê bidin projeyên wê yên xeyalî.”

El Alûsî got: “Tirkiyeya Erdogan bi rêya arîşeyan dixwaze dewletên herêmê bîne hember hev û stratejiyên wan lawaz bike, da ku bikare bi rêya sedan baregehên leşkerî, her wiha bi rêya fikrên toranî yê di nava Tirkmenan de belav kir, desthilateke demkî ferz bike û paşê jî berfireh bibe.”

Her wiha got: “Em nikarin tenê behsa planên îdeolojîk ên veşartî û siyasetên nexweş bikin, lê belê hewldanên dagirkeriyê êdî bi rêya komên milîs û alîkariya hêzên leşkerî dikin jî pêk tê, çi li Lîbyayê çi jî hewldanên dagirkirina hin giravan”.

Teysîr El Alûsî diyar kir ku pirsgirêk dê li herêma cografiya siyasî be û got: “Ev wê bi rêya kesên xwedî îdeolojiya îslama siyasî ya tundaw a cîhadîst ên ku destekê didin xeyalê Tirkiyeyê pêk were. Dixwazin dîroka dijbertiya gelê herêmê dûbare bikin û sedema ketina desthilata sext ya tarî bispêre gel. Ev jî komkujiyê xwînmêjên li Şam, Iraq û deverên din kirine, tînin bîra me.”

El Alûsî ev hişyarî dan:

1- Propagandaya bidawîbûna Lozana 1923’yan bi taybet hin xalên wê yên ku xizmeta projeya Osmanîbûnê dikin.

2- Amadekirina tawanên berfirehkirinê bi rêya bi sedan navend, nuqte û baregehên leşkerî ku em li Iraq, Sûriye û Lîbyayê dibînin.

3- Berfirehbûna ber bi Asya, Afrîka û heta Ewropayê, her çend bi şêweyên nixumandî be jî, lê di




naverokê de ew xeyal û xewnên nexweş hene.

4- Gurkirina aloziyên mezin ji bo berdewamkirina lawaziya welatên Rojhilata Navîn û çêkirina nakokiyan û mijûlbûna wan da ku wan ji armanca Tirkiyeya Erdogan dûr bixin.

5- Peydakirina hêzên îdeolojîk ên ku xizmeta projeya Osmaniyan dikin, mîna Îxwanan, di nava gelên herêmê de.

6- Di encamê de, welatên herêmê ji hev bixe û wan têxe nav nakokiyan di navbera netewedewletan de yên bermahiyên Sykes-Picot û nakokiyên navxweyî û xeyalên bindestiya aliyên herêmî û navneteweyî ji bo têkbirina aramiyê.

7- Çêkirina nakokiyan di navbera neteweyên Ereb û Kurd de û pevçûnê di navbera gelên wan de pêk bîne li ser asta herêmî û navxweyî li ser nasnameya neteweyî ya her du neteweyan.

8- Nûkirina projeyên Osmanîbûnê û Îxwanan bi bîrdoziya siyasî ji bo ferzkirina rewşa heyî.

Prof. Dr. Teysîr Abdulcebar El Alûsî daxwaz kir ku ji bo rûbirûbûna vê yekê pêwîste ku çend gav werin avêtin.

1- Naskirina stratejiyên aliyên din, bi taybetî li vir Tirkiyeya Erdogan û hêzên din ên herêmê û bi taybet jî projeya olî ya îslamî û tundraw a tevahiya herêmê.

2- Pêwîst e armancên sereke werin diyarkirin da ku pêşî li wê projeyê bê girtin, eger nebe hêzên herêmê û xelkê wê dê bikevin nava xefkên mijûlbûnê ku ewên li dijî wan ji wan re vedidin.

3- Divê konferansa yekitiya nîştimanî ya Ereb û Kurd û hêzên neteweyî û gelêrî ku hay ji proje û metirsiyên wê hene, were lidarxistin.

4- Beriya ku gelên me bikeve rastiyeke nû ku dê bi tundî, hesin û agir dewam dike, bi qasî ku desthilata tarî ya Osmaniyan berdewam kir, divê em li ser bingehên zanistê li çare û alternatîfan bigerin.

# Êrîşên dagirkeriya Tirk li ser Qadên Berxwedanê bi hevkariya PDK’ê

**Navenda nûçeyan**

**Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê diyar kir ku artêşa Tirk a dagirker li dijî qadên Zap û Metîna yên ku zivistanî jê reviya bû êrîşeke nû ya dagirkeriyê da destpêkirin. Gerîlayên Azadiya Kurdistanê jî bi çalakiyên xurt bersivê dide êrişan.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê bi daxuyaniyekê ragehand ku artêşa Tirk a dagirker li dijî Herêmên Parastinê yên Medyayê dest bi operasyoneke nû ya dagirkeriyê kir û wiha got:”Herêmên ku artêşa Tirk a dagirker di demsala zivistanê de ji ber derbên giran ên gerîla neçar mabû vekişe lê a niha dîsa dest bi êrîşên ser van qadan kir. Êrişên dagirkeriyê di 14’ê Tîrmehê de li dijî Qada Berxwedanê ya Kurojahro ya




Zapê çêbû, di 19’ê Tîrmehê de jî li dijî Qada Berxwedanê ya Girê Ortê ya ku bi piştgiriya PDK’ê dest pê kir. Di şeva 20’ê Tîrmehê de jî piştî bombardûmana zêde ya hewayî di sibeha 21’ê Tîrmehê de jî li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî ya herêma Şehîd Delîl a Rojavayê Zapê, êrişeke dagirker da destpêkirin.”

HPG’ê da xuyakirin ku hêzên wan li hemberî êrîşên artêşa Tirk a dagirker ya ku bi teknîka şerê dijwar û piştgiriya çeteyan dike û derbên giran li dagirkeran dixin û wiha domand: “Di 19’ê Tîrmehê li Qada Berxwedanê ya Girê FM dema ku dagirker ketin tevgerê, carekê bi çekên giran li wan hate xistin. Di 20’ê Tîrmehê de li Qada Berxwedanê ya Girê FM bi sûîkastê li cîhazeke jammerê ya dagirkeran hate xistin û ev cîhaz hate îmhakirin. Di 21’ê Tîrmehê de dagirkerên ku xwestin ji Girê Şehîd Zagros a Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî biçin Girê Şehîd Şîlan, bi taktîkên cihê 7 caran li dagirkeran hate xistin û pêşveçûna dagirkeran hate sekinandin.”

HPG’ê di dewamiya daxuyaniya xwe de wiha got:”Di 17’ê Tîrmehê de li Qada Berxwedanê ya Tabûra Ereban bi taktîkên gerîla yên kordîneyî li dagirkeran hate xistin. Tîmên gerok bi çekên ferdî û giran li dagirkeran dan. Di vê çalakiyê de bi qasî ku hate tespîtkirin 3 dagirker hatin cezakirin.

HPG’ê da zanîn ku di 19’ê Tîrmehê de artêşa Tirk a dagirker li qada Girê Ortê ya Metîna, li cihên ku hêzên PDK’ê lê bûn ji bejahî dest bi operasyonekê kirin û wiha domand: “Dagirker ji benda PDK’ê dest bi tevgerê kirin, ber bi qada Neqeba Tirvanîş û Şehîd Piling bi pêş ve çû. Di 20’ê Tîrmehê de dagirker ji qada Girê Ortê ya PDK’ê bi rê ketin û li Girê Ortê amûrên çavdêriyê bi cih kirin. Hêzên PDK’ê ev qad kirine benda tevgerînê ya artêşa Tirk a dagirker û alîkarî da ku dagirker ji vir êrîşî hêzên me bikin. PDK bi eşkerehî piştgiriyê dide dagirkeran û ev operasyon hê jî didome.”

# HESEN KOÇER: ŞOREŞA 19'Ê TÎRMEHÊ WÊ SERKEFTIN Û ÇARESERIYÊ MISOGER BIKE

**Hesen Koçer da zanîn ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê li ser bingehê tekoşîna 50 salî ava bûye û destnîşan kir ku beriya şoreşê bi 2 salan xebatên avakirina rêxistinkirina civakê û avakirina pergala parastinê hatibû destpêkirin. Koçer, diyar kir ku gelek alî êrişî şoreşa Rojava Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikin û dixwazin wê tune bikin, lê bi hevgirtina civakî gelê herêmê karîbûn destkeftiyên xwe biparêzin.**

Koçer her wiha bal kişan ser planên dijberiyê ku li dijî civakê têne bikaranîn û bang li gelê herêmê kir ku tevî hemû zehmetiyên jiyanî û aborî hevgirtina civakî hevgirtin û tekoşîna li dijî sîstema şerê Taybet biparêzin û da zanîn wê şoreşa 19'ê Tîrmehê wê serkeftin û çareseriyê misoger bike.

Cîgirê Hevserokatiya Meclîsa Rêveber a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hesen Koçer bi boneya salvegera Şoreşa 19'ê Tîrmehê bersiva pirsên Rojnameya Ronahî da.

**1-We bawer dikir ku şoreş ew ewqas dirêj bibke û hûn encamên wê çawa dinirxînin?**

Şoreşa demokratîk a di herêmê de pêşketiye encama tekoşîna 50 sal ji kar, xebat û bedelên giranbuha yên ku ji bona azadî û demukrasiyê hatine dayîne. Di destpêkê de jî nirxanina me ew bû ku wê şoreşa Rojava û ya Sûriyayê dirêj bike. Ji ber pirsgirêkên civakî, demokrasî, azadiya jin û pirsgirêka gelê kurd hene, ev jî ne mijarên wiha demkurt in.

Şoreşa Rojava ne wekî şoreşa Sûriyê û yên din bû, li ser hêmanên çareserkirina pirsgirêkên civakê yên aborî, çandî, siyasî û azadiya jin saz bû û li ser esasê azadiya civaka ekolojî û azadiya jin pêş ket. Şoreşên din li ser esasê hilweşandina dîktatorekî û avakirina yekî din pêk dihatin, lê şoreşa 19'ê Tîrmehê li ser esasê demokrasiyê saz bû û wiha hêza xwe ya leşkerî û siyasî ava kir.

Xeta sêyemîn a şoreşa 19'ê Tîremhê xeta civaka demokratîk e. Civakê esas digre, pirsgirêkên civakê asas digre. Em di wê baweriyê de ne ku heger sîstema rêxistinbûna civaka demokratîk pêş nekeve, wê ne gengaz be ku sîstema demokratîk ava were avakirin.

Destpêkê jî me pêngavek li ser navê Şehîd Rustem Cûdî û Şehîd Şîlan Kobanê destpê kir. Di çarçoveya wê de komîn û meclîs hatin avakirin. Di nava van meclîsa de xeta demokratîk pêş ket û Rêveberiya Xweser hate avakirin.

**2-Piştî şoreşa 19'ê Tîrmehê bi 2 salan Rêveberiya Xweser hate ragihandin, we çiqasî karîbû xwedî li nirxên şoreşê derkevin?**

Raste, ew rêveberî li ser esasê Meclîs û komînan saz bû. Tevgera civaka demukratîk(TEV-DEM) jî



di meha 7'an a 2011'an de hate avakirin. Di kanûna heman salê de Melcîsa Rojavayê Kurdistanê bi hilbijartinên Gel hate avakirin. Ev hemleyeke rêxistinî bû li ser wî esasî jî Şoreşa 19'ê Tîrmehê pêş ket. Di sala 2011'an de hêzên YPG'ê jî hatin avakirin. Bi vê boneyê em di serî de damezirînerê YPG'ê Şehîd Xebat Dêrik û hemû şehîdên şoreşê bibîr tînin.

Piştî xebatên 2 salan ji rêxistinkirina civakî Şoreşa 19'ê Tîrmehê destpê kir. Angu şoreş li ser mîrasekî rêxistinî hate destpêkirin. Ragihandina Rêveberiya Xweser jî di 21''ê Çileya 2014'an li Cizîrê, 27'ê heman mehê li Kobanê û di 29'ê heman mehê li Efrînê hate ragihandin. Di sala 2013'an de êrişên pir dijwar li ser Tirbespiiyê, Rimêlan û heta Qamişlo hatin.

Êriş ji aliyê Cebhet El-Nusra ve pêk hat, armanca wan dijberî û tunekirina Rêveberiya Xweser bû. Di roja ku me Rêveberiya Xweser ragihand civîna Cinêvê ya derbarê Sûriyê de hate lidarxistin. Wan jî êrişên dijwar li dijî herêmê pêş xistin. Bi rastî jî zarokên vî gelî qehremeniyek mezin nîşan dan û şer kirin, di encamê de bi dehan ciwanên vî gelî canê xwe feda kirin û şehîd bûn, heta me karî van destkeftiyên Rêveberiya Xweser biparêz in.

**3-Gelek hêzên navdewletî û herêmî destê xwe avêtine aloziya Sûriyê, ji bo rêveberiya xweser vê destwerdanê çi bi xwe re aniye û ji niha û şûn ve wê bandora wê çawa bibe?**

Hêzên navdewletî piştî 2013'an plansaziyek li ser Sûriyê çêkirin û planek taybet li ser Rojava-Bakur û Rojhilatê Sûriyê çêkirin. Planên êrişan li Paytexta Urdin Omanê hate lidarxistin.

Plan di wir de hate amadekirin û plansaziyên êrişan destpê kirin. Di civînê de DAIŞ û PDK'ê û dewleta Tirk hebûn. Di wê civînê de plansaziyên êrişên li dijî herêmê hatin amadekirin. Êrişa li ser Şengalê jî di wê civînê de hate danîn. DAIŞ'ê êrişî Şengalê kir, pêşmergeyên PDK'ê xwe vekişandin û Şengalê ji wan re hiştin. Li ser esasê wê civînê bingeha planên navdewletî hatin danîn û bingehê avakirina koalîsyonên navdewletî jî hate sazkirin. Destwerdan wê demê xurt bû, di wê demê de itîfaq hate kirin ku DAIŞ'ê êrişî PDK'ê neke û êrişî li dijî Şengal û Kobanê pêş ketin. Paşî wê DAIŞ xwe vekşîne û komên "Artêşa Azad" ji wan bigre û berê xwe bide Efrînê jî. Cerblusê jî wiha bû, DAIŞ'ê cilên xwe guhertin. Bi berxwedana şervanan plana wan neçû serî.

Di heman demê de êrişên wan li dijî Kobanê jî vala derketin, li wir jî nikarîbûn serkevin. Koalîsyona Navdewletî jî wiha destwerdan kir.



Di 2016'an de jî Rûsiya di xaka Sûriyê de destwerdan kir. Di wê demê de komên "Artêşa Azad" derbasî Şam, beşek mezin ji Helebê, Hema, Humis û Idlibê bibûn. Metirsîn li ser rêjîma Esed çêbû.

Bi destwerdana hêzên derve aloziya Sûriyê kûrtir kir. Piştgirtiya Tirkiyê ya ji itîlafa opozisyonê re alozî mezin kir. Di heman demê de mudaxeleya Koalîsyonê û Rûsiya di xaka Sûriyê de alozî girantir kirin. Sûriyê wekî 2 parçe, rojhilat û rojavayê Firatê parçe kirin.

**4-Gelek alî di nava hewldanan de ne, di navbera Rêveberiya Xweser û gelê herêmê de valatiyê derbixe, ji bo vê mijarên xizmetguzariyê bikar tînin, planên we li beranberî van hewldanan çine?**

Dema Rêveberiya Xweser serwer bû, DAIŞ herêmên ereban dagirkiribû. Lê piştî rizgarkirina Minbicê, Reqa û Dêrazorê li wan herêman jî Rêveberiyên Xweser hatin avakirin. Êdî gelê herêmê bi giştî di yek çeperê de li dijî DAIŞ'ê û xeteriya wê û komên din şer kir. Di heman demê de xebetên rêveberiyê jî mestir bû. Ji bo rêveberiya xweser mirov dikare bêje pirsgirêkên heyî pirsgirêkên rêveberiyê û pêşketinê ne, ne pirsgirêkên bi zanebûn têne kirin. Ji xwe dorpêça ji aliyê hikûmeta Şamê û PDK'ê bandorek mezin li xebatên rêveberiyê dike. Ji xwe civîna 4 alî ya di navbera Îran, Rûsiya, Tirkiyê û hikûmeta Şamê de jî di vê çarçoveyê de hate lidarxistin. Ew plan dikin çawa eşîran li dijî Rêveberiya Xweser pêk bînin, çawa wê karibin tevliheviyê derbixin û şerê taybet pêş bixin û wê çawa şerê kurd û ereb derbixin. Li ser wî easî û bi bingeha parastina rewa em têkoşînê didin meşandin. Ezmûnên me jî çêbûne, tevî kêmasiyan jî em li gorî wê xwe amede dikin û tekoşîna xwe hîn xurtir dikin.

Dagirkirina Efrîn, Girê Spî û Serkêkaniyê êrişa li dijî Şoreşa Rojava bû, ev êriş bi alîkariya hêzên navdewletî pêk hat. Li hember wê jî tekoşînek gelekî mezin tê meşandin û gelek şehîd û birîndar hatin dayîn.

**5- Di nêrîna we de şoreşa 19'ê Tîrmehê dikare bibe bingeha çareserkirina aloziya Sûriyê û herêmê?**

Şoreşa Rojava bingeha çareserkirina pirsgirêkên Sûriyê û tevahî Rojhilata Navîn e, ew ne wekî şeklê şoreşên din e. Di dîroka mirovahiyê de şoreş bê felsefeya siyasî nabe, li welatên herêmê şoreşên hatin destpêkirin şerê li ser iqtîdarê ye. Li Sûriyê, Misr, Iraq, Lîbiya, Îranê û Tirkiyê jî şerê wan li ser desthildariyê ye. Dixwazin werin şûna wan û xwe wekî wan diktatoran bi sîstem bikin.

Lê rengê şoreşa 19'ê Tîrmehê felsefeya netewa demorkatîk e, Ev sistem Serokatiyê pêş xistiye ku bibe anternatîfa sîstema dewletê ya heyî. Di vê derbarê de Rêber Apo dibêje: Ku rêgeza felsefî ya şoreşa me ne hilweşandina dewleteke û li şûna wê avakirina dewletkeke din e. Armanc avakirina civaka demokratîk e, li ser wî bingehî jî çareserkirina pirsgirêkane.

**6-Dijberî û zehmetî zêde ne, ji bo parastina nirxên şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê çi ji gelê herêmê tê xwestin?**

Piştî deh sal ji tekoşîneke bê hempa, gelê me bi zehmetiyan re rû bi rû ma, em careke din jî dibêjin ku wê tekoşîna azadiyê ne hêsan be, dê zehmetiyên aborî û jiyanê re rû bi rû bimîne. Ji ber ku em di nava Rojhilata Navîn de ne, em niha berdêla wê yekê datînin, rojane hevalên me yên QSD'ê û hevalên me yên din jî şehîd dikevin. Me şoreşek bi zehmetî ava kiriye, me bi hezaran şehîd û bi dehezaran birîndar dane. Gelek welatiyên me malên xwe winda kirin. Niha tişta ji gelê me tê xwestin li ser esasê şerê gelê şoreşgerî xwe bi rêxistin bike û destkeftiyên xwe biparêze. Gulek jî bi striyan parastina xwe dike. Gelê ku nikaribe xwe biparêze mafê wan ê jiyanê nîne. Nabe hemû xebatên parastinê tenê ji hêzên leşkerî re were hiştin.

Hêzên leşkerî bi hêza civakê xurtir dibe, em dizanin zehmetiyên jiyanî û zehmetiyên aborî hene. Lê em ê, tekoşîna xwe bimeşînin . Gerek em nekevin bin bandora şerê taybet, di demên dawî de dixwazin gel bidin koçberkirin û herêmê vala bikin. Ji bo wê pir piropoganda tê kirin. Wiha îda dikin ku pêşeroja vê şoreşê nîne, ev îda ne rastin, pêşeroja vê şoreşê heye. Tu şoreş wekî ya me ne ketiye xizmeta xeta azadiya civakê de. Em ne bê pêşeroj in, niha li meydanê pirojeya çareseriyê ya tu aliyan nîne. Tenê pirojeya çareseriya tevahî Sûriyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye û bi xeta Şoreşa 19'ê Tîrmehê ancax pêkwere.

Di demên dawî de poltîkayên taybet li dijî gelê me didin meşandin, madeyên hişbiriyê, fihûş û her wekî din li dijî civakê didin meşandin. Tişta ji gelê me tê xwestin bi kurd, ereb û suryan, çerkes û her wekî din hêmanên şoreşa xwe bi hevgirtina civakî biparêzin.



# Li hemberî dorpêçê gel li ber xwe dide

**Sucên dorpêça Hikumeta Şamê li ser gelên herêma şehbayê berdewam e. Di şert û mercên zehmet ên demsala havînê de tunebûna sotemenî, kehrebe û derman, rewşa welatiyan hîn zehmetir dike.**

**Esma Mistefa/ Şehba**

Dorpêça Hikumeta Şamê li ser Koçberên Efrînê yên li herêma Şehbayê jiyan dikin ev 5 salên ku dewamdike. Polîtîkeya dorpêçê di van salên dawiyê de bi awayekî giran tê meşandin û hikumeta şamê bi riya vê dorpêçê dixwaze careke din serweriya xwe li ser heremê pêkbîne. Lê heyanî ku gelê Efrînê û Şehbayê li ber xwe dide, ne pêkane ku ev yek pêkwere. Hikumeta Şamê rê nade ku madeyên sotemeniyê û derman derbasî herêmê bibin, çawa ku gel zehmetiyên tunebûna sotemeniyê di zivistanê de jiyan kirin, niha jî ji germaya zêde û tûnebûna kehrebeyê gel rastî zehmetiyên cidî tê. Her wiha zarok di vê rewşa ku têde pileya germahiyê zêde bilinde, di bin çadiran de jiyan dikin û rastî nexweşiyên giran tên.

Girêdayî mijara berdewam kirina siyaseta Dorpêçê û bandora wê li ser gel hevserokê meclisa Kampa Berxwedan Xilûsî Biso ji rojnameya me re axivî.

Xilûsî destnîşan kir, ku rêveberiya kampan di rewşa heyî de hemû erkên ku dikeve ser milê wan bi cih tîne û got:"Di rewşa heyî de bi taybet ji bo Kampan, rêveberiya Xweser û ya



Xilûsî Biso

kampan rojane di nava kar û tevgerê de ye. Li hember gel tavahî erkên ku ji wan tê xwestin pêk tînin. Di serî de ji milê peydakirina av, nan, bûz, derfetên kar peyda kirin û alîkarî ji wan re pêşkêş kirin tê kirin. Lê rûxmî van hemûyan zehmetiyên gel hene û nayên derbas kirin. Di Koçberiyê de jiyan kirin, her wiha di binê çadirekî de û di demsala havînê de jiyan kirin, ev bi serê xwe vîn û hêza berxwedanê dixwaze".

**Hikumeta Şamê di siyaseta xwe ya dorpêçê de berdewam e**

Xilûsî anî ziman ku ji ber dorpêça Hikumeta Şamê rewşa gel aloztir dibe û wiha domand: "Di demên dawiyê de hikumeta Şamê her ku dorpêça herêmê girantir dike û bi vê wesîleyê riyên herêmê li pêşiya welatiyan digre. Ji bo derbas kirina madeyên sotemeniyê astengiyan derdixe. Astengiyeke mezin di aliyê tunebûna gaz û mazotê de tê dîtin. Bi taybet di demsala havînê de û germahiya zêde divê kehrebe bê dayîn, lê ji ber ku sûtemenî nayê peydakirin derfet çênabe ku kehrebe were peydakirin. Di kampan de bi roj 2 saet û bi êvarê 3 saet tenê kehrebe tê dayîn. Ev yek jî bûye sedem ku gelek însanên temen mezin û zarok nexweş bikevin. Zarokên biçûk di bin çadiran de nikarin tehmûl bikin. Niha jî rêjeyeke mezin ji zarokan derbasî nexweşxaneyê bûne. Ev rewş ne tenê di hundir kampan de tê jiyan kirin, li Şehbayê tevahî rewş bi vî rengî ye. Di heyva bûrî de li gorî bîlancoya Heyva Sor a Kurdî 1789 zarok nexweş ketine".

**Ji ber dorpêçê derman derbasî heremê nabe**

Xilûsî destnîşan kir ku ji ber dorpêça li ser heremê pirsgirêka kêmbûna dermanan heye û wiha domand: "ji destpêka derbas bûna gel ji herêma Şehbayê re, di aliyê tenduristiyê de herêm bi derfetên kêm ji gel re dibe alîkar. Lê belê di van salên dawiyê de hikumeta Şamê sûcên dijmirovî li ser gel dide meşandin. Ev yek jî rê li ber kirîzeke mezin vedike. Rêveberiya Herêmê bi baceyên gelek giran dermanên pêwîst derbas dike. Ev yek jî dihêle ku em ji piraniya pêwîstî û nexweşiyên gel re nebin alîkar".

**`Gel bi sekna xwe pilanên dijminan vala derxist`**

Hevserokê meclîsa kampa berxwedan Xilûsî Biso di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku îradeya gel bi van siyasetan neyê şikandin û asta berxwdaniyê bilindtir dikin û wiha got: "Her çiqas dijmin û siyaseta dorpêçê li ser gelê Herêmê bê berdewam kirin û bixwazin îradeya gel têk bibin. Li hemberî wê gelê me yek gav jî paş de neavêtiye em vê yekê jî dibînin ku asta berxwedanî û tekoşênê bi hêrsa tolhildanê her diçe bilindtir dibe. Bi hêviya vegera Efrînê gel di sekna xwe de rûxmî hemû zehmetiyan bi îsrar e".

# Tirkiyê zagonên mafê mirovan binpê dike

**Evêsta Menaf/Qamişlo**

**Rêveberiya komeleya Mafê Mirova Evîn Cuma diyar kir ku hedefgirtina zarokan û jinan bi taybet, ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve, binpêkirina hiqûqa mirovî ya, bang li rêxistinên mafên mirovan ên navneteweyî kir. Ambargoya hewayî li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ferz bike û dagirkeriya dewleta Tirk bi dawî bike.**

Dewleta Tirk a dagirker di êrîşên xwe yên berdewam, li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, rasterast zarokan hedef digire, ku di encama van êrîşên hovane de gelek ji wan şehîd bûn û bi sedan zarok bi giranî birîndar bûn û hin ji wan jiyana xwe ji dest dan.

Li ser vê yekê rêvebera Rêxistina Mafên Mirovan li herêma Cizîrê Avîn Cûma destnîşan kir ku dewleta Tirk binpêkirina mafên mirovan bi taybet li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li herêmên Efrîn, Serêkaniyê, Girê Spî yên dagirkirî û tevahiya xeta sînor dike.

Evîn Cuma rêveberiya komeleya Mafê Mirova ya suriyê diyar kir ku bi sedemên şerê li herêma bakur û rojhilatê suriyê rûdayî û bê dengiya saziyên mafên mirovan hişt ku li herêmê ji aliyê çeteyan ve tevahiya binpêkirinan pêk tên û wiha got:" di sala 2013`an de komeleya Mafê Mirovan hat avakirin. Me girîngî dît ku komeleya Mafê Mirovan were vekirin, ji ber ku şerê ku li ser bakur û rojhilatê suriyê û li ser mirovan tê meşandin, şerkî pir dijwar



Evîn Cuma`a

bû. Ev şer hem ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve û hem ji aliyê dewleta tirik a faşîst ve tê meşandin. Herwiha bêdengiya saziyên mafên mirovan ji van êrîşan re, hîn bêtir rê û derfet didan ku ev êrîş bê navber bidomînin.

**' Kar û xebatên ku hatina meşandin'**

Evîn wiha berdewamî da axavtina xwe û got:" ji destpêka avakirina komeleya mafê mirovan, em bi erkê xwe dirabin, çi binpêkirin tê kirin em belge dikin. Di heman demê de pêk anaîna perwerdeyên li ser zagonên navnetewî mirovahî, mafên insanan, dîroka mafên mirovan û parastina jinê û zarokan, li ser vê bingehê perwerda wiha tên berdewam kirin, ji bilî wê jî di hindirê dadgihan de û di hindirê girtîgihan de, eger tecawizkirin hebin li gor giliyên ji mere tên, me belga dikir û me rêdikir cihên eleqadar ji bo lêveger bikin."

Evîn da zanîn ku gelek binpêkirinên ku dihatin kirin, giliyên tekane tên komkirin û komek ji kesên huquqî yên li derve tên e rêkirin her wiha ew jî lêkolînên zagonî li ser van giliyan tên kirin, ku bi çi rengî ew ê nîzbibin, li gor wê jî van giliyan radikin dadgihên navnetewî, yek ji van giliyan ji, welatiyên ku hatine koçber kirin, birîndar kirin, destdayin li ser malê welatiyan û yê ku bûne qurbanên şer û kiryarên dagirkeriyê. Zagonên zarokan ku ji bo parastina mafê zarokan hatine danîn û komeleya mafê mirovan jî ev zagon sepandin. Şopandina rewşa zarokan bi giştî, ku binpêkirinên ku di mafên wan de, bi karkirina wan di sînaha de û gelek karê ku ne li gor temê wan e.

**' Dagirkirina herêman û rasterast hedefgirtina sivîlan sûcê şer e '**

Evîn Cuma wiha pê de çû û got:" Mijara binpêkirina mafê mirovan, ji destpêka ku dewleta tirk a dagirker axa suriyê seranserî sînor ji Cerabils, Ezaz, Girê Spî, sere kaniyê û Efrînê dagirkir. Dewleta tirik a dagirker û çeteyên xwe êrişê Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Sipî kir. Armanca êrişan ji bo ku gel ne çar bimîne û koçber bibe, bi belafirên xwe, çekên qedexekirî û heta çekên kîmawî, fosforî û çekên şewtandinê, li ser gelê bakur û rojhilatê suriyê bê navber bi kar tîne. Di heman demê de ev şer li ser zarokan pir bandorê dike, ji dibistanên xwe hatin qutkirin, jin bi cilê reş di bin navê islamê li wan dikirin û gelek jin ji bo eskerê xwe bi kar anîn. Li ser vê bingihê gelek jinan ji bo ku ev yek qebûl nedikirin xwe intîhar kirin."

Even Cuma Rêvebera komeleya Mafê Mirovan di dawiya axaftina xwe de got:"Komeleya mafên mirovan li herêma Cezîre "raporên demkî pêşkêşî rêxistinên mafên mirovan ên navdewletî dike, mîna Komîteya Lêgerîna Rastiyan a Sûriyê ku binpêkirinên li dijî sivîlan belge dike, ji bilî danûstandina bi komîteyeke taybet re, ku binpêkirinên li dijî zarokan belge dike. Ji bilî derxistina raporên salane yên ku çavdêriya hemû binpêkirinên mafên zarokan li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikin û pêşkêşî dezgehên mafên mirovan dikin. Herwiha amadekirina dozên takekesî bo dadgehên navdewletî derbarê binpêkirinên mafên zarokan û ev hemû doz tên birêvebirin, li dijî dewleta Tirk û komên çekdar ên opozîsyonê ku binpêkirin û sûcên şer ên navborî pêk tînin.

Evîn Cuma, bang li hemû rêxistinên mafên mirovan û hêzên aktîf ên herêmê kir, ku ambargoya hewayî li ser esmanê Sûriyê li ber balafirên Tirkiyê deynin û got:" Jiyana dijwar a ku ev koçber û derbider dijîn, ji ber dagirkirina herêmên wan, û armanc kirina rasterast a sivîlan tawaneke şer e, ku armanca wê ya bingehîn pêkanîna guhertina demografîk li herêmê ye.

## FENER



### Rejîmên Tirk Û Rûs Şiklê Têkîliya Kirêt In

**Idrîs Henan**

Fena avdahatin û avrabûna deryayê li têkîliyên Rûsya – Tirkiyê van deh salên dawî hatiye. Beriya aloziya li herêmê û taybet li Sûriyê rû daye, di pêvajoyeke normal de diherikîn. Lê piştî salên 2011`an û vir de, têkîliyên siyasî yên herdu dewletan rastî hinek skendalan hatin. Piştî destwerdana Rûsya ya nava aloziya li Sûriyê, dawiya salên 2015`an, taybet piştî ku Tirkiyê balefira şer a Rûsyayê tîne xwarê, têkîliya herdu dewletan diqerise û nêzî salekê wisan dimîne. Lê ji ber ku rejîma Tirk xwedî berjewendiyên netewperest e û hewl dide bi lez û bez sûdê ji realîteya ku aloziyê afirandiye, werbigire û dagirkeriya xwe li herêmê berfirehtir bike, xwe davêje bextê sîzerê Rûsyayê û li ber rûyê cîhanê lîborîna xwe dixwaze. Lew re; ev têkîlî carek din di salên 2016`an de geş dibin û bi mudexeleya istixbaratî ya Rûsyayê nava hewldana darbeya 2016`an de, ev têkîlî şêweyê stratejîkbûnê li xwe bar dike û li ser hesabê têkîliyên bloka Tirkiyê ya NATO`yê, şiklî be jî, xwe berfireh dike.

Navbera herdu dewletan de peywendiyên hevkariyên gelek fireh hene ku digihêjin asta hevkariya stiratejîk; peywendîyên bazirganîyên mezin hene ji ber ku Tirkiyê xwarinê ji Rûsya re hinarde dike û bi hezaran şîrketên Tirk ên avakirinê û girêbestê di bazara Rûsya de kar dikin ku salane zêdeyî 5 mîlyar dolarî dixin xezîneya wê. Ji xwe Tirkiyê berê jî sîstema S-400 ji Rûsyayê kirîbû. Rûsya santrala nukleerî li bajarê Kyoto yê Tirkiyê ava dike û ji bo veguhestina gaza Rûsya ber bi Tirkiyê ve du xet dirêj kir.

Ya yekemîn bi taybetî ji bo bazara Tirkiyê û ya duyemîn jî veguhestina gazê ber bi Ewropa ve ye. Her wiha li hev kirin ku daboyên berhevkirina gazê li Tirkiyê ava bikin ku bibe navenda veguhestina gaza Rûsî ya ber bi cîhanê ve. Dîsa di derbarê herêma Nagornî Karabax de, li ser hesabê hevalbendê xwe Ermînya bi Tirkiyê û hevalbendê wê Azerbîcanê re li hev kiriye. Li Sûriyê jî bi rêya platforma Astana pê re li hev dike. Li Lîbyayê jî hinek nakokiyên wan hene ku Tirkiyê piştgiriya hikûmeta li Terablûsê dike û pê re itîfaqa Deryayê Spî îmze kiriye, lê ji aliyê xwe ve Rûsya jî piştgiriya aliyê dijber ê general Hefter kir.

Tevî ku Tirkiyê beşdarî sizayên rojavayî û DYA yên li dijî Rûsyayê nebûye, lê li Ukranyayê li dijî Rûsyayê balefirên bê mirov ên Beyreqdar dan şixulandin û dagirkirina Rûsya ji herêma Alqirim re jî nas nekir û li rex Teterên wê herêmê li dijî Rûsyayê radiweste. Radestkirina fermandarên togaya Azofê, erêkirina tevlîbûna Siwêdê ji NATO`yê re, skendalên nû avêtin çerxa têkîliya herdu dewletan.

Weke encam; ji daxuyaniya rayedarên payebilind ên herdu aliyan diyar dibe ku têkîliya navbera herdu rejîman de, pêşeroja nêz de, ji ber kûrbûna berjewendiyên demê, tevî ku lerizîneke dîrokî jiyan dikin lê ne gengaz bi yek derbê hilweşin. Lê di heman demê cewherê têkîliyên dewletdar rave dikin ku çendîn berjewendî hevbeş be, ewqas têkîlî li ser hesabê razberiyê şênbertir dibe. Lew re; ji ber vê zanîna bi naveroka avakirin û afirandina têkîliyên berjewendîperest ên dewletdar, pêwîste hesabên gelan ên azadiyê li dûrî van aliyan werin hûnandin ku li ber avdahatin û avrabûna têkîliyên qirêj ên aliyan neçe û cazîbiyeta xwe ya tenê serkeftinê ji dest nede.